

## Kuştin li nav dilê Tehranê de

Di 31.07.2024an de, dema ku Ismaîl Henîye bo pişikdarî di merasima destbikarbûna Serkomarê rêjma Îranê, Mesûd Pizişkiyan, çobû Îranê, kete ber hêrişa hajekek kurtmevda û hate kuştin.

dom»R:3






## Berxwedana malbatên şehîdan sembola şoreşê ye

Em hemû dizanin ku du sal bi ser şoreşa Jin, Jiyan, Azadî ya Rojhilatê Kurdistanê û Îranê re derbas dibe. Şoreşa Rojhilat ku piştî şehîdbûna Jînaya Kurdistanê bi pêşengiya jinên Kurd û xelkê Rojhilatê Kurdistanê piştî vegerandina termê Jînayê ji Tehranê bo Seqizê dest pê kir, li dijî şehîdkirina vê keça Kurd daketin qadan.

dom» R:6

*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (475) 05-08-2024 Buha (1000) Tûmen*



## Qirkirina Êzidiyan li Şengalê de birînek bo ser kezeba mirovatiyê

Di 3'ê Tebaxa 2014'an de DAIŞ'ê li dijî gelê me qirkirinek encam dan ku vîjdana mirovatiyê hejand. Di 10 saliya wê cinayeta li ser gelê me û canjidestdana Hezaran kes ji xelkê Sivîle Êzidî, em wan qurbaniyan bi rêzdarî bi bîr tînin. Êzidî ew ev para ji civaka kevneşopiyên herî qedîm ên Kurdanbi Hezaran sale ku li vê herêmê de jiyane û heta îro karîne xwe li hember êrîş û pitir ji 70 caran jînosayîd û qirkirina li ser xwe, xwe parastine.

dom» R:5

# Dergûşa Têhranê bo tu kesî ewle nine



N. Jêhat



Gelek caran hin ji berpirsên rêjîma Îranê û yêk ji wan Elî Yûnisî wezîrê berê yê Îtlaata rêjîmê, haydarî dabûn ku dive deshilatdarên rêjîmê nîgeranê cane xwe bin, di wan salên vê dawiyê de çendîn oparasyonên serkevtiye Îsraîl û bi taybetî kuştina Îsmaîl Heniye serokê Deftera Siyasiya Hemasê li nava dilê Têhranê de, rastiya wan haydariyan bi zelalî îsbat kir ku êdî çiyê dine Têhran bot u kesî ewle nine.

Kuştina Heniye li Têhranê de û rast li roja merasima destbikarbûna serkomarê Rêjîmê "Tehlîf" ê de, ku hewce bû rêjîma Îranê ji heçî demekî dine tedbîrên ewlehî berçav bigre bo parastina ewlehiya berpirsên xwe û mîvanên xwe, Îsmaîl heniye li Têhranê tête Kuştin.

Abûr û hetik çona rêjîmê li derheq neşiyaniya ewlehî û nebûna tu zaniyariyekê rûyê rastîne vê rêjîmê derêxist û nîşanî her kes û aliyekê da ku hemî gef û gurên rêjîmê û îdiaya parastina asayêşê ji bilî pûşê ber ba û bilqên ser Avê nebûye.

Rêjîma komara Îslamî bi armanca weşartina neşiyaniya xwe û kirîna abûr û hetka xwe ya ji dest çoyî, xwast wisa bide xuya ku hinde zaniyarî hene ku dikare jêvekolînê li ser şêwaz û çeka ku di kuştina Heniye de hatî bikaranîn bike.

Lê hindî zêdetir hetka xwe bir û her demjimêrekê tiştek radigehand û li dawiyê de bo her kesî Îsbat bû ku heta rêjîma vir û direvker nizane Heniye bi Dironê, yan Mûşekê, yan bombê, yan havêtina çekekê ji bînayên derdor hatiye kuştin.

Rêjîma Îranê li derheq kuştina Heniye, niha maye di navbera Nal û Bizmar de kanê gelo êrîşê bike ser Îsraîl yan ne?

Ger êrîşê bike ev êrîş çavan be ku derencamên xirabtir û xisarên mezintir bo ser rêjîmê çenebin.

Gelo hekî li hember kuştina Heniye li Têhranê de, bê deng be dê çavan li hember girûpên girêdayî bi xwe li deverê de bersivder be?


Gelo hekî êrîşê bike ser Îsraîl, bersiva Îsraîl vê care dê her wekî cara pêş de be?

Yan dîsan rêjîma Îranê bo betalkirina wan gefên xwe dê hine Mûşekan bihavêje nava welatên deverê yên bê bereva wekî Herêma Kurdistan û dê çend kesên sivîl û jin û zarokan bikuje?



## Dîlemaya paşeroja Îran li qelafa alozîya niha de

dom» R:4




## Siyaset, berjewendî ya hişmendî

dom» R:2

# Siyaset, berjewendî ya hişmendî



**N. Kerîm Perwîzî**

Siyaset li mêzekirineke rûkî de renge bi sade bê berçav û pêka hinek dîtingehan, renge aloz û tevlihev û tejî nerohnî bê xuya. Bi taybet demekê ku mirov dixwaze sînorên li navbera siyaset û warên din ên wek civaknasî yan mirovnasî yan aborinasiya civakî an reftarnasiya bi kom û ...ht diyarî bike, êdî sînorên vê gelek aloz têne dîtin ku wekû quncirek û hirî lihev aliyane ku derxistin û cudakirina wan gelek bi zehmet xuya dike.

Hekî ji kûrahiya vê derkevin û bi lezgînî mêzeyekê bikin, siyaset li têgihîştina giştî de wekî warek bo praktîkkirina daxwaziyên li asta giştî de tê berçav. Bi vê wateyê ku çi takek û çi girûpek hinek daxwazî hene ku ji asta warê kesîn derbas dibe û dikeve asta giştî an li meydana hizra giştî ya siyasetê, ew alav û rêkarane ne ku bo gihîştin bi wan daxwaziyan li ber xwe têne girtin.

Pêka vê dîtingehê, siyaset bi xwe daxwazî nîne belku rêkar û alav û mikanîzm e! ji mêjve ye ku du dîtingehên cuda jî bo vê alav û rêkarê hene.

Rêkar bi xwe dibe ku pêka hewcehiya kesîn û pêka dem, guherîn bi ser de bê yan mikanîzm divê rohn be û heta astekê neguher be û her kesek bi hemen şêweazê mifaê jê verbigrin.

Ew pirsyare li hundirê xwe de du beşên dij bi hev hene, du bersivên cuda li pey xwe tîne. Yek dibêje siyayset alavek bo gihîştin bi berjewendiyan e. Li vê dîtingehê de siayset weku rêkar û mikanîzm e, dibe ku bi pêka kes û dem guherîn bi ser de bê. Bi vê wateyê ku kesek xwedî helwîst an bi wateyeke din li pey berjewendiya xwe be, dikare û ew azadî heye ku pêka hewcehiyên xwe kar bike û pêka berjewendiyên xwe, guherîn li rêkaran de bike û her demekê ku hewce bike û berjewendiya wî ya kesîn bixwaze, mifahê ji mikanîzm û rêkarên cuda werbigre.

Bersiva Duyem jî evaye ku siyaset renge girêdayê berjewendiyê be lê ne berjewendî û daxwaziya kesîn! Li vê dîtingehê de civak û niştîman li bereya herî pêş de tê danîn û siyaset dibe hizir û lêhûrbûnek bo gihîştin bi xêr û bereketa giştî û bexteweriya hemû kesî û bexteweriya niştimanê ye. Bi vê wateyê ku siyaset vê hizrê li xwe digre ku bexteweriya xelkê û aramiya niştîman tê de tê watekirin, îca ew hizir dikare reng û tama cuda li xwe bigre ji çepa çepê dîktatorîxwaz û dijî milkê taybet ve bigre heta rasta rastê dijî azadiya kesîn û qurbanîkirina hemû kes û netewek li pêxema nasnameya netewî û regezeke diyarîkirî.


Li rastiyê de hişmendî li wir de bi wê wateyê tê ku ji çi dîtingehekê ve mêzeyê civak û paşeroj û derbasbûya vê dike û çi tiştekê bi xêr dizane ku bo vê yekê pêngavê hilde. Li wir de ye ku berjewendiyên netewî û giştî têne diyarîkirin, lê ev pêka hişmendiya xwe ye! Her ji wir ve ye ku cudahiya dîtingehên çep, rast, parêzvankar, tundajî û paşvero, berjewendiyên netewî bi awayeke cuda şirove dikin.

Kesê ku bi hizra wî siyaset ji berjewendiyê pêk tê û her kes li her demek dikare alav û rêkarên vê pêka berjewendiyên xwe biguhre, li dîrokê de qutabxaneyên zêde li paş mane û wa nîne ku ti nav û nîşanek ji wan nemabe, ji Epîkorê serdema kevnar ve bigre heta Makiyavêllî, ji vê qutabxanê ve hatine û ew bersiva wan bûye ku dem û kes li hilbijartina şêwe û alavan de azad e û li rastiyê de berjewendiya kesîn û tak, servetir hatiye diyarîkirin. Ev dîtingeha dikare hilgirê alaya çepên tundajo û herwisa hevkarê rastê faşîst be jî!

Çendîn dehik in ku li Kurdistanê de qutabxaneyek hatiye avakirin ku bi qutabxaneya "Gelawêj" hatiye navdêrkirin, çimkî li heyva Gelawêja sala 1324 a Rojî de ji aliyê Pêşewayê nemir ve, hatiye avakirin.

Li qutabxaneya Gelawêjê de ku mirovan perwerde dike û bi rêya perwerdekirina mirovan û karên bi kom dixwaze karlêkerî li ser paşeroja civakê û avakirina niştîman de bike, siyaset wata û rengek taybet heye ku zêdetir li pileya duyem a dîtingehan wate bersiva hişmendî bo rêkarên siyasî de cih digre.

Gotineke binavdeng a "Dr. Qasimlo"yê nemîr ê darêjerê qutabxaneya Gelawêjê heye ku dibêje: "mêjve ye ku em dibêjin siyasetê exlaq çnîne, me li Kurdistan û Îranê de exlaq aniye nav siyasetê".




Li wir de armanca "Dr. Qasimlo" ew dîtingeha rûkî ya exlaq nîne, wate exlaq li wir de ew nîne ku tak an kes dibe digel kesên derdora xwe reftara baş hebe û li axaftinê de rêzê ji kesan bigre, ew tiştên rast û destpêkî ne ku bo her mirovekê ku li civakê de dijî, hewce ne, belku ew exlaq e ku li siyasetê de ku "Dr. Qasimlo" îşare bi wan dike ku pêk tê ji pêbendî û derwestî. Bi vê wateyê ku exlaq li siyasetê de derwestî û pêbendî li hember hizrîn û dîtingeha te ye û dûrdîmenek e ku bi xelkê didî nîşandan. Hekî hûrtir mêze bikin, exlaq li siyasetê de wate wekî kes an girûpeke siyasî, dîtingeha te bo civak û bo jiyana baş a civakê ye û dûrdîmena niştimana te li ber çav digre, li rêkaran û dariştina mikanîzma vê de vê dûrdîmenê dikî bi rênîşander û li her ewraz û nişîvekê de li her mil û astengeke rêyê de dubare dordîmen û dîtinghên vê dibe rênîşander û derwest û pêbendî li hember vê xala hizrînê ye ku, xwestiye civakê ji rê derxîne.

Exlaq li siyasetê de ji vê dîtinghê ve, êdî pêbendbûn bi wan rêkarane ye ku te dariştine û bi xtircemî ve ku te daye xelkê û bi vê handanên ku daxwaziyên te bo te bi cih anîne û eger astegiyek li ser rêya te peyda bû, xwe jê neban nakî û rast û dirûst bi xelkê xwe radigehînî ku rê hemen rê ye û em li hember de derwestin lê ev lemperane li ser rêya me peyda bûne ku bi xwesta me nebûye.

Pêbendbûn bi siyasetê de bi exlaq, digel tûşbûn bi nerîtran cudaye! Nerîta siyasî û rêkarên vê renge serdemekê de bi pêka rewşê hatibe dariştin lê bi berçavgirtina guherînan li derdor û biyavên vê û li startejî û jêopolîtîkê de, dibe dubare û dubare lê bê fikirin û rêyeke nû peyda bikin lê bi derwestbûn bi binyata hizriya vê.

Herwisa li vê dîtingehê de êdî pêbendî bi exlaqê siyasî ji vê pêk nayê ku her çi li siyasetê de dizanî û dibihîzî, bo raya giştî bas biki! Belku siyaset meydaneke dijwar a tejî dujmin e, lewma nabe li asta giştî de bas bê kirin û renge dujmin zêdetir ji alîgirên te ji wan zaniyarane mifahê verbigre! Lê exlaq li siyasetê de wa hewce dike ku li derheq hizra dariştî û baskirî de derweat bî û îro mikanîzmekê li ber xwe negrî û sibê rêkareke dilxwaz lê li dijî hizra giştî li ber xwe bigrî.

Wek mînak nabe bas ji pêbendiya xwe bi hizir û dîtingeheke lîberal bikî û xwe bi xwediyê hizra lîberal bizanî û bixwazî ew hizir li civakê de bê birêvebirin, lê hekî kesek rexneyekê ji te bigre an bi şaş ji te fam bike! Bi bêrêzîkirinê bersiva wî bidî û daxwaza fetisandina dengê rexnegir bikî!

An wek mînak bi hizra te serweriya yasa li civakê de berjewendiya giştî dabîn dike û hizra vê yekê te hebe ku divê hemû kes li beramber yasayê de vekhev bin, lê sibê hekî kesekî nêzî te ku berjewendiya te ya kesîn dabîn dike, yasa binpê kir, binpêkirinên wî bi dilgeşî verbigrî û hewla hêcetanîn bo parastîbûn ji sizayayê bi ser wî de bidî, lê kesekî cuda ji hizra te ku renge bi sivikî yasa binpê kiribe, bi awayeke tund digel reftarê bikî ku tûşî sizaya bidarvekirinê bikî.

Bi giştî, dîtingeha berjewendîxwazî bo siyasetê, li hewla vê yekê de ye ku nanekî îro bi deyn bide li pêxema bidestveanîna kadeyekê li sibeynê! Lê dîtingeha hişmendî bo siyasetê ku qutabxaneya Gelawêjê rêrevî ji vê dike, li hewla vê yekê de ye ku niştiman avedan û tejê xêr bike û deşteke tejî genim biçîne ku sibê bo hemû kesê derfeteke dadperwerane hebe ku bibe xwediyê nan.


Qutabxaneya Gelawêjê, qutabxaneya şerefmendî û serbilindiyê ye, avakirina vê li hemû mamosta û qutabî û hogirên vê, pîroz be.

# Kuştin li nav dilê Tehranê de



N. Elî Munezemî





Di 31.07.2024an de, dema ku Ismaîl Henîye bo pişikdarî di merasima destbikarbûna Serkomarê rêjma Îranê, Mesûd Pizişkiyan, çobû Îranê, kete ber hêrişa hajekek kurtmevda û hate kuştin.

Piştî wê bûyerê hemûyan tiliya xwe dirêjî Îsraîlê kirin û dezgeha zanyarî û parastina wê, anko MOSSAD, bi bikerê wê yekê dane zanîn.

Lê karbidestên Îsraîlê û dezgeha MOSSADê xwe li derbirîna helwêstê parastin û wek hemû demê, ew operasyona jî di bêdengiyek tewaw de hate kirin. MOSSAD îstixbarata derve ya Îsraîlê ye.

Mossad hem îstîxbarata kevneşopî hem jî operasyonên biyanî yên êrîşkar pêk tîne. Ajans rasterast girêdayî ofîsa serokwezîrê Îsraîlê ye û ji sala 2021ê ve David Barnea serokatiya wê dike.

**MOSSAD di derbarê xwe de agahdariya pir hindik belav dike, û pir tiştên ku bi gelemperî têne zanîn li ser çavkaniyên nenas û texmînên bikêrhatî ne. Ajansa MOSSAD salek piştî damezrandina Îsrael, li aliyê Davîd Bengurion ve di 1949an de hatiye avakirin.**

Ew ajansa di komkirina zanyarî û encamdana operasyonan dijî dijminên Îsraêl û ewên tehlûkeyan li ser jiyana jihûyan saz dikin, rolek bilind û ektîv dilîze û heta niha daye eyankirin ku ew li erk û wezîfeyên xwe de micid û pêdagir in û qet dijmin û tehlûkeyan bi kêm nadanin.

Kuştin yek ji rêbazên MOSSAD ên herî navdar û cihê basê e. Armancên girîng rêberên filistînî, efserên ereb û vê dawiyê jî zanyarên peyvendîdar bi bernameya navokî ya Îranê ve girêdayî ne.
Texmîn tê kirin ku bi hezaran kes li aliyê wê ajansê ve, ji dema ku ajans hate damezrandin heya niha hatibin kuştin.

Her çend ajans kêm caran li ser rêbazên xwe şîrove dike jî, rêveberê berê yê MOSSADê, Meir Dagan, berevanî li taktîka kuştinan kir û da zanîn ku ew bi belavkirina tirsê di nav rêzên rêxistinên dijmin de, wan asteng dikin û dikarin bibin sedem ku endamên mayî ji tirsa jiyana xwe, li encamdana operasyonên dijî jihû û Îsraîlê vekişin.

Bi sedema wan operasyonan li aliyê MOSSADê ve, zaf caran helwestên tund li aliyê civaka navnetewî ve bi dûv xwe re anye û Israîlê çend caran ji aliyê wan welatên ku kuştin lê hatine kirin reaksiyonên tund wergirtine.

Tê gotin ku Îsraîl bi kuştinên hanekî li ser xaka welatekî sêyem, serweriya wan welatan binpê dike. Li ber hindê jî MOSSAD naxwaze bi eşkere berpirsiyariya kuştinên hatine kirin qebûl bike.

Operasyonên MOSSADê li xaka Îranê de, di wan salên daviyê de berfirehiyek zêde hebûye û ewan di hêlekê de çendîn zanayên Etomî yên Îranê kuştin ku di programa çekên etomî ên Îranê de dixebitîn.

**Li gere gihîştina Îranê bi çekên etomî, ew dibin hereşeyek mezin li ser hebûna Îsraîlê. Li tenişta wan operasyonan de, sîxurên MOSSADê karîn ku bêhtir li nîv ton belge û dokûmentan li ser bernameyên etomî ên Îranê, li Îranê bidizin û derbasê Îsraîlê bikin.**

Karbidestên Îranê jî niha gihîştine wê qenaetê ku MOSSAD di Îranê de bi berfirehî wegeşiya e.

Elî Yûnisî, şalyarê berê yê wezareta îstixbarata Îranê bi eşkere dibêje ku «pêdviye ku hemû karbidestên Îranê nîgeranê canê xwe bin.» Ew gotina dide eyan kirin ku karbidestên Îranê jî ew rastiya qebûl kirine ku MOSSAD ne cihê henekan e.

Piştî hêrişên 7ê oktobra 2023an li aliyê Hemasê bo ser Îsraîlê, karbidestên Îsraîlê ji holê rakirina wa rêkxistinê xwe re kirin armanc û heya niha bi deyan fermandeyên şer û endamên rêberiya Hemas û Hizbullahê kuştine. Kuştina Îsmaîl Heniye di nava dilê Tehranê de carek din da selimandin ku destê ajansa MOSSADê dirêje.

Ew yeka dikare gelek armancan temam bike. Li aliyekê we dide eyankirin ku ew li ser gotina xwe a ji holê rakirina Hemasê micid in û rêberên wê rêkxistinê li her derekê bin, armancin bo Îsraîlê û li aliyek din jî dixwat hêza şiyana xwe nîşanî karbidestên Îranê bide û wan re bêje ku ewlehiya wan hind qahîm nine û ew nabe karekê bikin ku bibin tehlûke li ser Îsaîlê, neku Îsraîl eger bixwaze, dikare wan jî bikuje.

Armancek din a girîng ewa bû ku li dijminên xwe re bêje ku xaka Îranê ne cihek ewleye û ew nikatin dijminatiya Îsaîlê bikin û birevin herin bin per û baskên wê rejîmê.

Niha hemû aliyek li benda bersiva Îranê e ka ew yê çi bikin piştî şikestina rûmeta wan ya çineyî. Rêberê Îranê di axaftina xwe de daxwaza tolhildanê kiriye û xwe xwîndarê meselê dizane.

Lê niha hevsengî di Rojhilata Navîn de di berjewendiya Îsraîlê de ye û Dewletên yekgitîyên Amrîka jî bo berevanî li Îsraîlê ji ber hegera hêrişên Îranê çend gemî û balafir û hêzên leşkerî şandine bo aliyê Rojhilata Navîn.

Ew dibe çavnihêr bin û bizanin ka di wan demên tê de yê çi biqevime û xwe bo sinaryoyên cuda cuda hazir bikin.
Her qevimînek dikare rasterast bandorê li ser pirs û xebata me hebe.

# Dîlemaya paşeroja Îran li qelafa alozîya niha de





N. Kawe Ahengerî
W. Hesen Mukerem

Pizîşkiyan wek serkomarê rêjîma Îslamî ya Îranê hate diyarîkirin û destpêka karê navbirî jî bi tîrora Îsmaîl Heniye, serokê deftera siyasî yê Hamas li Tehran, hat şîrînkirin.

Aloziyên li Rojhilata Navîn gelek zêde dibin û welatên mezin hêz xwe bi şereke cîhanî re rû bi rû dibînin. Di vê kûrte nivîsê de dixwazim rewşa îro û pêşeroja Îranê bi giştî û Kurdistanê bi taybetî bidim binirxînim.

Gava Rûsyê êrîşî li ser Ukraynê kir, gelek kes (yek ji wan Pûtîn) wisa digotin ku di navbera demeke kurt de artêşa Rûsya dewleta Ukraynê dagir dike, Lê belê berxwedan û xweparastina gelê Ukraynê û serokên siyasî yê wê dewletê û piştgiriyên Rojavayê nehiştin ku vê hêvîya Putinê pêk were.


Şer weke qurbaniyeke mezin bo her du aliyan, heta niha berdewam e û her çend Ukraynê nikarîbû Rûsya bi temamî bişkêne lê Rûsya jî nehat ku bi temamî bi serkeftinê were.

Her ev dema ku Macron, serkomarê Firansayê, bi nirxandin û agahiyan ragihand ku pîlan nîşan didin ku vê şer gelek dirêj bibe.

Heta niha şer li Ukraynê berdewam e ku têrorîstên Hamas bi êrîşa bo li ser fistîvaleke hunerî û kultûrî li Îsraîlê re karesateke mirovî li 7ê Cotmeha sala derbasbûyî de afrandin.

Gelek ciwan û jin û zilam hatin kuştin û hejmareke mezin jin û zarok jî bi zoorê êxsîr kirin û bi xwe re birin Xezê. Ev yeka bû sebeb ku artêşa Îsraîlê bi êrîşeke berfireh û dirêjxistî bo li ser Xezê kir û têkoşînek mezin lidarxist da ku vê herêmê ji hêzên Hamas bistîne. Di nav şer de, gelek jin û zarok hatin kuştin û xelkê sivîl jî jiyana xwe ji dest dan.

**Şerê di navbera Îsraîl û Hamas de ne tenê wekî şerê du aliyên bi navên artêşa Îsraîl û Hamas tê naskirin, lê di rastî de daxwaziyên rast û ne rast ên Komara Îslamî, Tirkiye, Qeter, dewletên Rojavayê bi giştî û Amerîkayê bi taybetî, Rûsya, Erebistana Seûdî û gelek aliyên din ên girêdayî vê şerî hene.**




Ji ber vê, bo pêşniyara vê şerî hewce ye ku ziyan û berpirsiyariya gelek aliyên berçav were girtin.

Piştgiriyên haşanekirî yên Komara Îslamî ji girûpên têrorîst weke Hamas, Hizbullah û... hwd ku hemû Îsraîl wekî dijmin nas dikin û di rastî de ji bo dijberiya Îsraîlê hatine afirandin, û Komara Îslamî li asta taybet ve girêdayî vî şerî kiriye.

Banga serokê yekem a Hamas ji bo merasima "tahilîf" yê Mesûd Pizîşkiyan li Têhranê û kuştina di li cihê bêhnvedana wî de Xaminey û rejîma wî gelek zêdetir li berê tevlî kûrahiya şer kir.

**Niha Xaminey yek ji mirovên herî nêzîk û hevalbendê wî ku mêvanê wî jî bûye li kêlega wî hatiye kuştin. Ev yeka hem ji aliyê siyasî û hem jî aliyê hêsiyetî ve bo Xamineyî pir giran tewav bûye.**

Krîzên han pêsîra hukûmeta Îranê girtin e û roj bi roj aloztir dibin û dûkela vê rewşê jî diçe nav çavê xelkê Îranê û bi taybet jî gelê Kurd.

Lêbelê, Kurdistan ji ber mîratê şer û xebatên komelî û peywendiyên hezên siyasî û partidariyan, hêsantir ji parçeyên din yê Îranê ji bo hikûmeta ye û vê yekê metirsî û tolhidanê zêde dike.

Di demên borî de me dît ku hikûmet li hemû herêmekî û hemberî her kesekî de nekariye berxwedanê bike, di dawiyê de kerb û kîna xwe bi ser Kurdan bi taybetî jî partiyên Rojhilat rijandiye.

Niha di vê rewşê de wisa gelek pirsên girîng hene: Gelo kengî partîyên Kurdî ji çar parçên Kurdistanê dê hevalbendyekê bi bihevre çê bikin? Heke şer tê Rojhilata Navîn, pêwîst e ku hêza Pêşmerge ji bo parastina xak û gelê xwe hebe?

Rojhilatê Kurdistan wekî parçeyên din yê Kurdistanê hebe hêzên neteweyî û herêmeke ji bo biryaran? Kengî partîyên Rojhilat bi giştî û Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bi taybetî, dê şerên çarenivîsê dest pê bike?

Di rastiya rewşa şerî de, em wekî Kurdan alîkerî û hevaltiya bi berpirsiyariya me ji aliyê şerê çi ye, dîdemokrasiya Rojavayê an otorîteriya Rojhilatê? Çawa em bi opozîsyona Komara Îslamî ve têkildar bibin û têkiliyên xwe wekî hevçav bi xwe daxin? Û gelek pirsên din ên pêwîst ku bi zûyî wergirtin.

Di dawiyê de ez bawer im ku vê alozî û şer her çend li Rojhilat xweş nebe û kuştin û nebûna ewlekariyê li peye, lê her rastî ye ku vê rewş û krîz bi gelek derfetan bo Kurdan bên afirandin.

Lê di bin wergirtina pirsan de dikarin wê rewşê bo erd û gel bidin alîkî.

# Qirkirina Êzidiyan li Şengalê de birînek bo ser kezeba mirovatiyê



**N. Nûredîn Sofîzade**



Di 3'ê Tebaxa 2014'an de DAIŞ'ê li dijî gelê me qirkirinek encam dan ku vîjdana mirovatiyê hejand. Di 10 saliya wê cinayeta li ser gelê me û canjidestdana Hezaran kes ji xelkê Sivîle Êzidî, em wan qurbaniyan bi rêzdarî bi bîr tînin.

Êzidî ew ev para ji civaka kevneşopiyên herî qedîm ên Kurdanbi Hezaran sale ku li vê herêmê de jiyane û heta îro karîne xwe li hember êrîş û pitir ji 70 caran jînosayîd û qirkirina li ser xwe, xwe parastine.

Êzidî ku di dîrokê de gelek caran bi komkujiyan re rû bi rû bûne, di 3'ê Tebaxê de bi komkujiya herî hovane ya dîroka xwe re rû bi rû bûn.

Di vê qirkirinê de ku DAIŞ'a hov û cinayetkar encamp da, bi hezaran Êzidî hatin qetilkirin, bi hezaran Êzidî ku piraniya wan zarok û jin bûn hatin revandin û li bazarên koleyan hatin firotin.

Dema gelê me yê Êzidî li ber çavên cîhanê ji aliyê DAIŞ'ê ve dihat qirkirin, hemû cîhanê çavên xwe danane ser hev û li hember vê cinayetê de bê deng man.

10 sal bi ser Komkujiya Şengalê de derbas bûn Rêxistina tirorîstî a DAIŞê di êrîşa bo ser Şengalê de nêzîkî 5 hezar jin û zarokên kurdên êzdî hatibûn kuştin.



10 sal bi ser komkujiya Şengalê da derbas bûn û Hikûmeta Herêma Kurdistanê roja 3yê Tebaxê weke "Roja Komkujiya Şingalê nas kir.

**Rêxistina tirorîstiye DAIŞê 10 salan berî niha 03.08. 2014an de êrîşî Şengalê kiribû û nêzîkî 5 hezar jin û zarokên kurdên êzdî kuştin û 200 hezar kurdên êzdî ji Şengalê derkevtibûn û bê mal û hal û derbider bûn.**

Rêxistina îslama tûndrew ya bi nave Dewleta Îslamî li Iraq û Şamê (DAIŞ) ku armanca wê ya serekî têkbirina piroseya serbixwebûna Herêma Kurdistanê û destkevtên Herêma Kurdistanê bû ji aliyê hin dewletan ve bi ser Herêma Kurdistanê de hatibû şandin.

DAIŞê di 03-08- 2019an da êrîşî Şingalê kir û bi 5 hezar kurdên êzdî kuştin û revandin. Herwiha zêdetir ji 200 hezar kurdên êzdî penaber bûn û li kampên Herêma Kurdistanê û Bakurê Kurdistanê bi cî bibûn.

Rêxistina terorê DAIŞê ya ku piştî dagirkirina Mûsilê û gelek deverên din ê yê Êraqê çekên giran yên Amerîkayê bi dest xistibûn êrîşên xwe li dijî Herêma Kurdistanê berfirehtir kiribûn.

Bi piştevaniya hin erebên li herêmê DAIŞ ji bilî Şingalê li deverên weke Rebîa, Wankê Sinûnê,Zûmarê bi cî bibû. Pêşmergeyên Kurdistanê li eniyên weke Kerkûk, Dîcle, Mexmûr û Mûsilê zêdetir ji 700 kîlometreyan şerê DAIŞê kirin. Herwiha derbeya herî giran li Daeş,ê dan.

Mixabin qedera Şengalê û xelkê wê yê Kurdên Êzidî, piştî derbasbûna 10 salan bi ser vê cinayeta hovane de, niha jî şêlû û aloze û nihajî bi sedan jin û keçên Êzidî winda ne, nihajî xelkê şengalê di navbera leyîzên aliyên siyasî her wisa derbider û penaberin, û venegeryane ser mal û jiyan û zêdê xwe, niha jî şengaê bêhna şer û barût û xwînê lê tê û kavlên vê nehatine avakirin, niha jî rojane em guhdariya nuçeya peydakirina gorên bi kome Êzidiyan dikin.

Derd û êşa Êzidiyan herwisa girane, û li ser birînê xwe de dinalîne, ev qedera bi keder gelek kêm hevxem hene, jînosayda li ser xwe hekî çi bi jan û azar dibînin, lê bê dengiya civatgeha cîhanî û welatên xwedî qawet û saziyên ku xwe parêzvanê mafê mirov dizanin, hinde dine birîna Şengalê xedatir kiriye.

**Bêguman Xwişk û birayên me yên Êzidî, tenê ji ber Kurd bûnê û herwisa ji ber baver û oldariya xwe ya cuda ketine ber êrîşa qirkirina DAIŞê Komkujiya Şengalê û ew cinayetên ku tirorîstên DAIŞê 10 sal berê li hemberî xwişk û birayên me yên Êzidî encam dan, berdewamiya wan komkujî û cinayetan in ku bi dirêjiya dîrokê li dijî gelê Kurd hatine kirin.**

Di salvegera kuştara Şengalê de hevxemî û êş û xem û azara xwîşk û birayên me yên êzidî em bi ser xwe de parve dikin û bê guman azara birîna Şengalê li ser cestê heçî Kurdekî welatparêz giraniyê dike û dema em nav û êş û xema girane Şengalê dibihîsin, xema me giran dibe.

Qurbaniyên Şengalê hertim li dilê me de zindîne û birîna ser dilê me hertim dikele û xema wan girane û ji bîr naçe.

# Berxwedana malbatên şehîdan sembola şoreşê ye



N. Sîmîn Rûhanîzade
W. Hesen Mukerem



Em hemû dizanin ku du sal bi ser şoreşa Jin, Jiyan, Azadî ya Rojhilatê Kurdistanê û Îranê re derbas dibe.

Şoreşa Rojhilat ku piştî şehîdbûna Jînaya Kurdistanê bi pêşengiya jinên Kurd û xelkê Rojhilatê Kurdistanê piştî vegerandina termê Jînayê ji Tehranê bo Seqizê dest pê kir, li dijî şehîdkirina vê keça Kurd daketin qadan.

Piştî serhildana xelkê Seqizê, bajarên din ên Rojhilatê Kurdistanê jî bi armanca şermezarkirina tawanên rejîmê li dijî keçeke Kurd û piştevaniya xwe ji xelkê Seqizê re, hatin meydana şoreşê û berxwedan kirin.

Weke ku ji me re diyar e, ji destpêka şoreşê ve jinên Kurd bi rakirina xavika ser serê xwe, birîna porên xwe û dayîna dirûşma Jin, Jiyan û azadî, reng û semboleke jintiyê bû agirê şoreşê. Ewqas pê neçû ku şoreş û serhildana giştî ya li dijî rejîma Îranê pel havêt bajarên navendî yê Îranê.

Ew serhildana li dijî rejîma Îranê ya 45 salî û berxwedana qehremanane ya gel sînorên Îranê derbas kir û navê Jîna û Kurdistanê gihand seranserê cîhanê û li hemû cîhanê û bo balkişandin bi guhariya mafên gelên Îran û Kurdistanê deng veda.

Ev xwenîşandana seranserî ya ku wek volkaneke kîn û nefreta gel li dijî rejîma dagîrker teqiya, ku hemû parên civakê tê de beşdar bûn û daxwaza mafên xwe dikirin, bingehên rejîma totalîter hejand.

Her çiqas gelên bindest ji desthilatdaran bêzar û nefret bûn jî, li kolanan bi awayekî sivîl û bê tundî daxwaza mafên xwe kirin.

Komara Îslamî ku di tevahiya jiyana xwe de şoreşeke bi vî rengî ya tund û berfireh li dijî xwe nedîtibû, bi lez û bez dest bi tundiyê kir û xwepêşander kuştin û birîndar kirin.

Rejîma Îranê dixwest di demek pir kin de bi hemû hêza xwe agirê şoreşê vemirîne, lê berevajî daxwaza xwe, şoreş ji wê hêzê zêdetir bû ku difikirî.

Tundûtûjiya ku me behs kir li hemû bajaran hate dîtin, lê tiştê ku rejîmê li Rojhilatê Kurdistanê bi ser xelkê de dikir, ragihandina şerekî fermî bû li dijî welatiyan, li bajarên Îranê jî bi gaza rondikrêj êrişî xelkê dikir lê li Kurdistanê, bi fîşekan yan eger çekên giran jî nebana bi kalaşnîkof li xelkê Kurdistanê dixist û xwe ji encamdana tu cinayetekî nediparast, jin, zarok, kal dikirin armanc, ew dikuştin û birîndar dikirin an jî di girtîgehan de îşkence li wan dikirin. .

Tişta ku li Kurdistanê li ser van kesan hat kirin, jenosîdeke eşkere bû, lê tevî hemû xwîna ku bi neheqî li Kurdistanê hat rijandin, destanrêsiya gelê me bê mînak bû.

Di vî warî de çi qas mirov dikare bêje û binivîsîne jî, ji bo vegotina tiştên ku qewimîne jî hindik e.



Hêjayî gotinê ye ku tişta me li jor behs kir tenê ji bo ronîkirina ka rengê şoreşê hîna li rojhilat maye û helwesta malbatên şehîdan çawa ye û hêzên dagirker kariye wan bêdeng bike.

Em dizanin ku windakirina hezkiriyên we pir zehmet e, nemaze ku ew zarok, dê û bav, bira û xwişkên we bin û xwîna wan ji aliyê dijminê we ve bi neheqî hatine rijandin, cergê mirov dişewt e.

Malbatên şehîdên Kurdistanê her tim ji bo gelê Kurd bûne sembola berxwedanê û di nava civakê de xwedî cihekî taybet in ya ku heta niha şoreş zindî ragirtine malbatên şehîdan in.

Tişta balkêş helwest û çalakiya malbatên şehîdan e ku tevî êşa windakirina hezkiriyên xwe bi lehengî û berxwedaneke bêhempa li dijî dagirkeran têdikoşin.

Di cihê ku çokên xwe hembêz bikin û xem û kedera xwe hembêz bikin û xwe lawaz nîşan bidin, bi reftarên xwe yên şoreşgerî nîşanî dost û dijminên xwe dan ku zarokên wan ji bo parastina maf û rûmeta xwe şehîd bûne û bi serbilindî serê wan bilind kirin e.

Dê û bavên şehîdan, zarokên şehîdan an jî xwişk û birayên wan xemên di dilê xwe de vediguherînin nefreta pîroz û li dijî rijandina xwînê radibin.

Ev lehengane her fersendek wek çileya şehîdan, salvegera şehîdbûna wan û … hwd vê wek firsendekê bikar tînin ku kîna xwe bînin ziman û nîşan bidin ku hêj xwîn di damarên şoreşê de diherike.

Me dît û niha jî dibînin ku malbat şehîdên xwe bi piştevaniya gelê birûmet û welatparêz di bîranîna şehîdan de bi xwendina sirûdên şoreşgerî li ser gorên şehîdan û dayîna dirûşmên welatparêziyê, li şûna şîn û taziyê û li şûna cil û bergên reş li xwe bikin, kincên ku sembola kurdayetiyê ne, wek Ala Kurdistanê, hewrî û Axabanî û cilûbergan nîşan didin ku ew sembolên mana şoreşê ne.

Dayikên şehîdên me bi dilên tijî hesret û keder li ser terim û gorên şehîdan peymana xwe ya bi rêya zarokên xwe re nû kirin an jî di nava girseya gel de qîriyan ku zarokên wan şehîd ketine û goriyê Kurdistanê û rizgarî û şoreşa gel in.

Malbatên şehîdan li hemû bajarên Rojhilatê Kurdistanê ji bo gelê Kurd sembola berxwedanê û ji bo dijmin jî sembola tirsê ne.

Bandora van kesan li ser gelê Kurd ewqasî heye ku rejîm xistiye qedeman, Li Bokanê cejna jidayikbûna şehîd Mihemed li ser gora wî pîroz dikin, lê rejîmê bi başî fêm dike ku ew sembolên şoreşê ne û carek din ji vê derfetê mifahê werdigrin kû xwîna nav demarên şoreşê de diherkînin û bi piştevaniya xelkê birûmetê Kurdistanê dibêjin ku şehîdên me milkê hemû Kurdistiyekê ne û em heta dawî nefesa xwe dirêjederên rêya wan in, sembola hermana şoreşa Jin, Jiyan, Azadî ne û her di yekemîn roja şehîdbûn ezîzên me, me dest bi biryar û helwest û nivîsîna manîfestoya şoreşa Jin, Jiyan, Azadî kir..

Di dawiyê de ez bejna xwe li ber mezinahî û netirsiya wan malbatên diçewînin ku bûne bingeha yekitiya rojhilata me û bûne bingeha berdewamiya vê şoreşê.

## Nerîna



**“Kemal Kerîmî”:**

**“Bijîşkiyan nexwediyê kesayetî û ne jî piştgiriya xelkê ye ku bikare siyasetek nû li dijî siyaseta Xamineyî pêk bînin”**



**“Mesûd Barzanî”:**

**“Birayên me yên Êzidî ji ber kurdbûn û baweriyên xwe yên olî rastî kîn û hovîtiya çeteyên DAIŞ’ê hatin û hatin qirkirin”**



**“Benjamin Netanyahu” :**

**“ Îsraîl niha bi Îran û alîgirên wê re di “şerekî piralî” de ye.”**



**“Mihemed Şîa Sûdanî”:**

**“Pêwîst e bi lezgîn Kerkûk hikûmeteke herêmî ya hevseng ku pêdiviyên welatiyan pêk bîne ava bike”**

# Bi nêzîkbûna salvegera destpêka şoreşa “Jin Jiyan Azadî” tirsa rêjîma Îranê zêde dibe



**N. Eskender Ceiferî**

Piştî derbasbûna nêzî 3 salan di ser destpêka şoreşa Jîna re, Kurd û neteweyên din ên mafxwarî li Îranê di xebata xwe de li dijî dagirkar berdewam in.

Piştî ku keça Kurd bi navê Jîna Emînî di nîva Îlona 2022’an de li Tehranê ji aliyê polîsên rêjîma faşîst a dagirkar ve hat şehîdkirin, xwepêşandanên li dijî rêjîmê li Kurdistanê dest pê kirin û piştre li herêmên din ên Îranê belav bûn.

Heya niha jî ev serhildan, bi şêwazên ciyawaz û bi taybetî li navçeyên neteweyên mafxwarî berdewam dike.

Di rojên derbasbûyî de Pexşan Ezîzî keça Kurd bi darvekirinê hate sizakirin ku di heyama şoreşa Jînayê de hatibû girtin. Ev biryara dadgehê, tirsa dagirkar ji şoreşê dide xuyakirin.

Ev têkoşîn, herwisa bi navê Jin, Jiyan, Azadî tê binavkirin.

Salekê beriya niha ku rêjîmê fikir dikir kariye serhildanê kontrol bike, xelata Sakharov ji bo Jîna û malbata wê hate pêşkêşkirin.

Ev derfetek bû ji bo ku Kurd bikarin dengê mafxwaziya xwe zêdetirî berê hildin.

Ji destpêka şoreşa Jînayê ve her roj vîdyo, wêne û raport ji Îranê derdikevin ku siyaseta baviksalarî ya rêjîmê nîşanî me didin.

Ger di bin desthilatdariyeke wiha faşîst de rewşa jinan biguhere, wê bandorê li ser rewşa jinên li welatên din ên Rojhilata Navîn ên weke Iraq û Afganîstanê jî bike.

Vê têkoşînê heya niha kariye ji çend aliyên cîhana rojava destekê werbigire, lê ev têr nake. Ew xelk ji ji bilî ku ji bo rizgariya neteweyên mafxwarî xebatê dike, ji bo azadiya jinên cîhanê jî têdikoşe. Niha jinên li Kurdistanê û herêmên din ên Îranê nûnerên jinan li welatên din ên Rojhilata Navîn in.

Jin di vê têkoşînê de bi tenê nîn in. Di vê têkoşîna mezin de ji bilî jin û zilaman, homoseksuel, LGBT û kêmîneyên din jî cih digirin. Ev yekemîn şoreşa jinan a cîhanê ye ku li Kurdistanê dest pê kiriye û pêwîste li hemû cîhanê bê bicîkirin.

Beriya salekê rojnameya Lîberation




a çapa Parîsê di raporteke de eşkere kir ku şaredariyê, biryar standiye ku wêneyê Xumeynî avakerê rêjîma gemar a faşîstên Tehranê rakin û li dewsa wî, wêneyek ji serhildana Jîna danîne wir. Ev jî bû sedema acizbûna rêjîma Îranê. Niha salek di ser vê biryara şaredariya Parîsê re derbas dibe lê hewlên rêjîma Îranê ji bo guhertina vê biryarê ser neketine.

Herwisa her piştî ku şoreş gurr bû, Annalena Baerbock wezîra derve ya Almanya ragihandibû ku ew dîsa li Îranê riftara hovane ya rêjîmê li hemberî xelkê dibînin. Sipaha Pasdaran ya rêjîmê her roj xelkê têror dike. Lewma niha pir girîng e ku pêleke din ya dorpêçan bixin ser rêjîmê û bi taybetî ser Sipaha Pasdaran. Wê got ku dîsa em bi awayekî eşkere dibêjn em li rex xelkê wêrek li Îranê disekinin û em têrorkirina welatiyên Îranê ji aliyê rêjîmê ve şermezar dikin.

Beriya niha jî Komeleya Mafên Mirovên Kurdistanê li Genevê ji Neteweyên Yekbûyî xwastibû li dijî rêjîma faşîstên Tehranê tevbigere.

Parêzvanên Mafên Mirovan, Ensemble Contre la Peine de Mort, û Komeleya Mafên Mirovan a Kurdistanê-Genev piştgirîya avakirina şandeyeke navneteweyî ya serbixwe ya lêkolîna rastiyan li Îranê kiribûn. Pişt re jî bi alîkariya Kurdan ew şande hate avakirin û wê şandeyê bi raporta xwe Îran şermezar kir.

Di daxuyaniya wan de hatibû: Ji dema ku xwepêşandanên li seranserî welat piştî şehîdkirina jina ciwan a Kurd Jîna Emînî dest pê kirin, desthilatdaran sedan şehîd hene ku beşeke zêde ji wan jin û zarok in.

Rayedarên Tehranê bi hezaran kes ji ber ku tevlî xwepêşandanên aştiyane bûne binçav kirin. Wan bi kêmanî şeş kesên ku bi xwenîşandanan re têkildar in, li ser bingeha sûcên nezelal ên şerê li dijî Xwedê an gendeliya li ser rûyê erdê, bi darvekirinê siza kirine.

Herwisa gotin ku em ji ber bikaranîna hêzeke zêde ya desthilatdaran li dijî xwepêşanderan, bi taybetî li parêzgehên Belûçistan û Kurdistanê, gelekî nîgeran in.

Windakirina bi zorê ya xwepêşanderên birîndar û kuştî û redkirina rayedaran ji dayîna cenazeyên kuştiyan ji malbatên wan re jî şermezar dikin.

Hêzên zordar ên rêjîma Komara Îslamî li Tehranê jî êrîşî zanîngeha Şerîf kirin û çend demjimêran zanîngeh dorpêç kirin. Ew jî piştî protestoya xwendekaran û bi danîna kemînan ji bo xwendekarên dihat û tê de di encamê de hejmareke mezin ji xwendekaran hatin binçavkirin û ji wan xwendekaran jî li wir hatin birîndarkirin.

Tawaneke din a Komara Îslamî êrîşa li ser girtîgeha Êvîn a li Tehranê bû. “Êvîn” bi kiryarên dijmirovahî yên li dijî girtiyên siyasî û çalakvanên biyanî yên ku di zindanê de tên ragirtin navdar e. Tê gotin ku bi sedan welatiyên binçavkirî yên vê dawiyê jî li vê girtîgehê ne.

Di encama vê êrîşê bi dehan girtiyan jiyana xwe ji dest dan.

Mafê jiyana azad, jiyaneke bi rûmet û hebûna mafên siyasî û civakî, beşeke bingehîn a mafên mirovan ên vê serdemê ye. Mafê ku ev 44 sal in ji aliyê rêjîma Komara Îslamî ve tê zewtkirin û ji gelên Îranê hatiye standin.

Niha piraniya bajar û deverên Îranê ji Kurdistanê heya Belûçistanê, ji Ehwazê heya Azerbaycanê, ji Gîlanê heya Tehranê, Îsfehan, Meşhed û bajarên din bi tundî ji aliyê rêjîma Komara Îslamî ya Îranê ve tên tepisandin û her kêlî em şehîdkirina kesekî ji aliyê rêjîmê ve dibînin. Komara Îslamî hemû riyên têkilîdanîna bi mirovên derveyî Îranê re digire yan jî kontrol dike. Niha gelek dijwar e ku bi bajar û navçeyên curbicur ên Îranê re têkilî çê bibe û Komara Îslamî ya Îranê bi qutkirina întêrnêtê û rêyên din ên girêdana gel û çewsandina raperîna gelên Îranê hewl dide ferzkirina dîktatoriya xwe li ser gelên Îranê bidomîne.

# Çawa em dikarin di dibistanan de nifşek tijî hest û hezkirina welat perwerde bikin?



**N: Rojan Kurmanc**



Parastina nirxên netewî bi perwerdeyê dest pê dike. Di serî de mal û malbat, dê û bav, û pitre jî bi dezgeh, dibistan û zanîngehan berdewam dike.

Heger zarokên me ji hêlin û dibistanên serete neyên perwerdekirin û giyan û hişmendîya netewî di mejîyê wan de neyê çandin, Kurd û Kurdayetî di bedena wan de namîne û hestên netewî bi wan re çênabe.

Çêbibe jî wê jar û lawaz be û wê girîngîyê nedin netew û netewayetîyê.

Hebûn û tunebûna netew, millet yan welatekî bi hebûna nirxên wî ve girêdayî ye.

Niştimanperwerî, ziman, çand û tore, dem û dezgehên netewî, artêş û hêzên ewlekarîyê, aborî û hestên civakê tev nirx in.

Nirxên ku netew, millet û welatekî li ser lingan dihêlin û zînde dikin ev in.

Perwerde roleke sereke û bibandor di qonaxên jiyanê de dilîze ji bo têgihiştin û perwerdekirina mirovan bi giştî, divê rola perwerde di geşepêdana welat û gihandina armancan de hebe.

Perwerde dikare nifşekî pêş bixe û civakeke welatparêz a saxlem ava bike.

Divê xwendekar di hemî warên pêşveçûn, tenduristî û hezkirinê de gelek baş amade bibin.

**Divê li dibistanan de heftiyê rojek ji bo bilindkirina alaya Kurdistanê, xwendina sirûda Ey Reqîb û şîretkirina xwendekaran ji aliyê birêveber û mamosteyên xwe ve were veqetandin.**




Ez dikarim bibêjim ku bilind Kirin Alaya Kurdistanê û sirûda netewî yek ji faktorên herî girîng û bibandor e ku dikare hestên netewî biafirîne û hestên hezkirina ferdekî ji ax, gel û welatê xwe re çêbike.

Ev erkek netewî, perwerdeyî û wijdanî ye Bi sirûdên netewî em dikarin nifşek tijî hest û hezkirina welat ava bikin.

**Sirûdên neteweyî û nîştmanî beşek ji sembolên neteweyî ne ku bi nasnameya neteweyî ve girêdayî ne, Eşkere ye ku nasnameya neteweyî ne taybetmendiyeke kesayetî ya tu kesî ye, Di vê çarçoveyê de sembolên neteweyî yên hevpar, ziman, dîroka neteweyî, têkiliyên xwînê û nijadî, muzîk û xwarinê pêk tên.**

Ji ber bandora bûyerên cûda yên civakî, Kesên di bawerî û nirxên xwe yên tevgerî de nasnameya neteweyî di nav nasnameya xwe de dihêlin.

Bo mînak carnan em dibihîzin ku dibêjin (ew kesekî temam kurd e).

Hewce ye Ji bilî pêşxistina zanîna xwendekaran û hînkirina wan ji bo parastina jîngehê, guhdana li ser tenduristiya xwendekaran û hwd.

girîng e di nêrîn û peyama her mamosta û dibistanekê de ev xala girîng hebe, hîn kirin û hilkirina Alaya Kurdistanê û hînkirina sirûdên netewî û nîştimanî bandorkirina li hestên xwendekaran û afirandina hesta niştimanperwerî û hezkirina ji ax û gel re.

Divê cehd li ser perwerdehiya xwendekaran û şirovekirina nirx û reftarên civakî û neteweyî ku di reftarên xwendekaran de bêne xuya kirin.

Ji ber vê yekê, ya giring di piroseya perwerdeyê de, guhdana li ser sirûdên netewî û nirxên netewî, ku divê di dibistanan de bêne xuya kirin, daku civakek baş û saxlem were afirandin û nifşek amade û tijî hest û hezkirina ji bo xak û gel divê di paşerojê de bikaribe bi berdewamî welatê xwe li hember dijmin biparêze, daku îradeyek netewî ya netirs ku dijmin bitirsîne çêbike.

Parastin ne tenê hilgirtina çekan e, divê hişyarî û jêhatîbûnek pir baş be daku xwe û nîştimana xwe biparêzin.

# Piroseya yêkîtiya netewî û pirskirêka dîplomasiya Kurdistanê



N. Hasan Harrani




Mirovahî şahide ku him di hemî pêvajoyên dîroka mirovahîyê de, him jî di vê sedsala dawîn de ti tekoşînekî li ser esasê îdeolojîyek şid û yekpare û li ser ruknê prosesa yek rêxistinîyê tekoşînên bi serkeftinê dawî bûne nîne. Hemî tekoşînên ku serkeftin bexşê gelê xwe kirine û bi çarçoveyek berfireh derbasî dervayî sînorên xwe bûne bi prosesên hevkirin û hevkarîyên navxweyî yên di nava beş û alîyên wê netewê de ku pêkhatîye misoger bûye. Di vir de nakokîya herî balkêş hebûn û çêkirina hêzê ye. Yan jî famkirina tewrê bikaranîna
Ev hêza desthelatîyê ye.

Du famayîyên çêkirin û afirandina hêzê hene. Di hemî dîroka mirovahîyê de ev tim tê dîtin. Ev herdû awayê çêkirin û bidestxistina hêzê li gorî hişmendîya desthelatdarî û xwesteka bikaranîn û kontrolkirina wî li ser civakê hasil bûye.
Yek cureyê avakirin û afirandina hêzê têkele. Yanî ji jêr ber bi jorve hêz kom dibe û ev bi piranî li gorî daxwaz û xwesteka bidestxistina hêz û desthelatdarîyê ye û mebesta bikaranîna cureya vê hêzê tenge. Li gorî zumreyekî biçûk û marjînal e. Tewrê bikaranîna vê hêza desthelatîyê bêtir di direktîfa tatmînkirina xirsên şexsî bikar tê. Encamên ev cureya hêzê, derketina derîyê dawî bêguman hasilkirina erk û rêveberîyek hişk û tûndrav e. Mînakên ev rengê desthelatdarî û hatina wucûdê a hêzê li cîhanê û bi taybetî jî l rojhelata navîn gelekin.
Rengê cureyê hêza duyem bêhtirîn sist, nerm û li ser esasê lihevkirin û hevkarîya hêl û alîyên civakê yên ciwazin. Bingehê vê cureya hêzê qewîne û ger li ser dabeşkirina hebûn û çavkanîyên aborîyê û dabeşkirina desthelatîyê prosesekî demokratîk, hevkar û adil hasil bibe dikare sazûmanîyekî mayînde û demdirêj biafirîne. Mînakên vê yekê jî li rûyê cîhana medenî hene û bi pêşketina teknîk, ragihandin û cîhana dijîtalî ev hişmedî dikare bi hêsanî û bi lez li rûyê cîhanê bê belavkiririn û bi cîhkirin.
Niha emê werin ser mijara dîplomasîyê. Sedema ku me van xalan danî holê eve. Reng û teşeyê sazîmanîyê, birêvebirin û hişmendîya ku li ser van herdu cureyan hasil dibe dîrek di kar û barên xwe yên sîyaset û dîplomasîya nav cîhanî/nav dewletî de nîşan dide. Ji ber vê yekê, ev xalekî muhîme.
Erka hêzê û sazkirina hêza desthelatîyê teqez divê li gorî rastî û sosyolojiya civakê were wucûdê. Di Kurdistanê de ev heştê sale tekoşîna li ser daxwaza prensîbên cihana medenî têdayîn. Wekî me got ev daxwaz, sedsalî zêdetire heye û li gorî vê daxwaz û armancê jî tekoşînek hatîye dayîn. Destpêka vîya rêxistina Xoybûnê ye. Hatina wucûdê ya tekoşîna li ser prensîbên nûjen a vê tekoşînê bê guman Cumûrîyeta Mahabadê ye ku di bin rêberîya Pêşewa de hasil bibû.
Bi rastî jî ew jibo hemî Kurdan tecrûbeyek gelek bi qîmet bû û ew tecrûbe û ew ked di dîroka me de cihekî sanaze.
Piştî wê tecrûbeyê heya niha li hemî deverên welêt tekoşînek bêhempa heye. Şûna em vana tim rexne bikin û nebaş û xerab nîşan bidin, divê em heqê vana teslîm bikin û tiştên ku kême û di qada navnetewî de encam nagire bikin mijara nîqaşê û jê encamên baş wergirin.
Ti kêmasîyekî me Kurdan ji hêla tekoşîn û fedakarîyê de û herwiha bedêldayînê de nîne.
Kêmasîya hemî alîyên Kurdan yên sîyasî ewe ku di wan 80 salan de li gorî rasîya netewa xwe ya civakî analîzekî pisporî ku di nezera sosyolojîyê de bête kirin bi awayekî rêk û pêk nekirin e. Hinek alî sosyolojîya Kurdistanê bi temamî wek hedef dane pêşîya xwe û li ser daxwazekî tundrav xwestine vê sosyolojîyê tenê bi muhendîsîya sîyasî biguherînin. Ev daxwaz bersiva erênî li hemberî xwe nedîtîye, bilaeqis lê pêşîya xwe barîyer peyda kiriye. Ev rewş di encamê de him ji alî sîyasî de him jî ji alî avakirina rêxistinkirina civakê kêmreng maye. Encam pêşweçûnekî kulek derxistîye holê. Nêzîkatîya din jî lokatîfmayîna partî û tevgeran e.
Her çiqas daxwaz û prensîbên nûjen yekparekirina civakê be jî ev tenê di daxwazê de maye û lingê vîya li nava civakê nehatîye çêkirin. Kar û bar, bikaranîna pirosesên tekoşînê bêtir di nava sînorên herêm û eşîrên mezin de hatîye hepskirin.
Gelek bandor û têkelên derdorî ên biçûk jî hene lê kanalên pêşveçûna doza Kurd û Kurdistanî bi giranî li ser van herdu kanalan diherike.
Pêşî divê tevgerên Kurdistanî ji nû ve analîzekî sosyolojîk, çandî û bawerîyan di nava xwe de bikin. Di şûna ku tenê hinek beşên vê sosyolojîyê ji xwe re esas bigirin divê li ser esasê qebûlkirin, jîyandin, xweşbînî û hemêzkirinê prosesekî ava bikin. Divê eşîr jî werin qebûlkirin lê di vir de prensîba derbasdar ya yekparekirina netewî be. Yanî berjewendîyên eşîrî, bawerî divê nekeve pêşîya prosesa netewî. Lewra hêza parastger li asta herî jorîn di hevgirtin û yekbûna hemî beş û alîyên sîyasî, civakî, çandî û bawerî de kom dibe. Şemsîya mezin eve. Yase û qanûnên bên çêkirin, prensîbên bên danîn û qebûlkirin divê hemî li gorî sînorên van besên sosyolojîya Kurdistanê bên amadekirin.
Ger sazîmanîyek wiha li nava me Kurdan de bête hasilkirin, wê hêza hevgirtinî bandor û sîrayeta xwe li derûdor û nav cîhanî bide nîşandan.
Perçebûna navxweyî astenga herî mezin e li pêşîya qebûlbûna dîplomasîya Kurdistanî li nav cîhanê.

**1-** Divê pêşî vê hêz û alî daxwazên xwe yên ku şûna hemî meslehetên Kurdistanî de dibînin deynin alîyekî. Ev xapekî perdekêşîyêye ku nahêle ti partîyek an jî alîyek xetayê xwe di vî warî de bibîne.

**2-** Bi xwe nebawerî û nebawerkirina bi hêza civakê tirsa herî mezin e jibo vê hişmendîya me. Nexwe hêz gele û hêz ji gel peyda dibe. Ew çax çima em dabeşkirina hêzê û derfetan li ser vî gelî ferz nekin!
Îro dîplomasiya Kurd ku di nava cîhanê de bê îtîbare û nayê balê sedemên wî ev xalên me heya niha rave kirine. Alem jibo bi mirov bawer bibe û bikaribe bi mirov re têkilîyek domdar çêbike li sazîmanî û avakarîya mirov ya navxweyî ku ka çiqas pêşeroj waed dinêre. Ger te ev di nava xwe de ava kiribe ew çax dikare bi te re têkilî çêbike, kar bike û bazarîyên pêşerojê plan bike. Prosesên cîhana medenî wihaye.
Wekî me got, amadekirin û nîzamkirina vê prosesê divê tenê alîyên sîyasî daxil nebin. Li qada cîhanê entellektuel û akademîsyênên civaknasîyê, ên beşa zanyarîya siyasetê, pisporên têkilîyên navnetewî û gelek hêlên zanyarîyê ku civakê dîrek eleqeder dike tevlîbibin û li gorî rastîya civaka xwe di encama niqaşên zanyarî ên berfireh dikarin prosesekîwiha amade bikin. Vana dikarin ji Pêşewa heya rêberên niha dijîn û xwedî ramanekî sîyasî û civakî ne sûd wergirin. Lê xala esasî divê meslehet û berjewendîyên civakê be. Ev proses divê ne tenê li ser nêrînên lîderên sîyasî be. Lewra bixwazî nexwazî ramanên lîderekî çiqas berfireh be jî dîsa jibo netewekî bisînor e û teng dimîne.
Îro ji ber sedemên me li jor anîye ziman dîplomasîya Kurdistanê liser esas, daxwaz û projeyên partîyan birê diçe. Li ti deverekî cîhanê de karekî wiha nîne. Ev tenê di nava me Kurdan de rûdaye. Mînak îro sazî û statuya herî bilind ku wek parlemen hatiye wucûdê Başûrê Kurdistanê ye. Lê ji ber astengên hiqûqa navnetewî û ji ber kêşeyên navxweyî raste rast nikare li ser navê hemî Kurdistanê dîplomasiyê bike. Heta qasî ku dikare bike jî ji ber nêzîkatî û berjewendîyên lokatîf naxwaze di derbarê problemên parçeyên din têkelî mijaran bibe.
Ew çax tenê çare avakirina sazîyekî netewî ya bi ser partî û rêxistinan heye. Îro KNK heye. Lê di nêrîna min de ti partîyekî jî di vî warî de erkekî bi temamî û fireh nedaye vê organa herîbilind. Ji ber problemên navxweyî gelek partî ji vê sazîyê dûr disekinin û sazî nikare rola xwe bi cî bigehîne.

# Xwepiçûkdîtîna Kurdan û Meyla Wan e Çand û Zimanê Serweran/Serdestan



N. Kofîxwar



Roja iroyîn ji şerê fizîkî pitir şerê derûnî yê ku bi destên serdestên/ serweran li ser kurdan tê kirin armanc girtiye ku takekesiya  kurdan xirab,pûç bike û xwebaweriya wan ji holê rake û wan bike dewşîrme.

Bêhtir bi derfetên teknolojiyê, bi rêya polotîkaya serdestan bi dehan rêzefilmên TV û înternetê, bi hezar saziyên sîvîl, bi soşial medyayê ve di demeke kin de aşkere ye ku dagirker bi serketine.

Gelek kurdên bajarî ji koka xwe dûr bûne xwe bi hişmendî û zimanê netewên serdest ve pênase dikin û hewl didin di rojeva jîyanê û dinyayê de bi wî hawî ji xwe re cîhekî bigrin.

Wekî tê zanîn di her keliyekê de teknolojî xwe pêş dixe. Ew pêşketin di heman demê de dikeve rojeva welatan, civakan.

Helbet bi ziman û termên teknolojiyê ve bi ziman û hişmendiya serdestan, Kurd bê dewlet nasnameya wan e fermî di dinyayê de hêj cihekî saxlem nîn e.

Civak li vê serdemê pitir ji êrîşên xirab û mêtinger re vekirî ye. Heger tu xwedî hişmendiyeka kurd û Kurdistanî nîn bî bi rêya teknolojiyê teqez tu yê bi hişê wan entegreyî sistema serweran bibî.

Bi hişê wan xwe binerî wek nêrîna wan rêzê bidî xwe.

Nikarî xwe ji vê dûr bixî. An tu yê ji dûrî gelek xizmetan bîbî an jî bi hiş, rê û rêbazan wan entegreyî sîstema wan bibî.

Ji ber ku roja îroyîn jiyan neçar bi wî awayî rê diçe.Tu neçarî telefon, aplîkasyon, internet û hwd bikar bînî.

Ji ber wê bo bi ser xwe, wek xwe bimînî xweyî hişmendiyeka kurdistanî bî hay ji çanda xwe bî, qet nebe li nav xwe, di mala xwe de bi zimanê xwe biaxivî.

Zar û zêçên xwe bi zimanê xwe mezin bikî. Li wan fêrî nirxên xwe û dîroka xwe bikî. Mezinên xwe, pakrewanên xwe bidî naskirin.

Doza Kurdistanê bidî naskirin. Da ku hebûna te ya dahatî ango zarên te pêşrewên kujerên xwe hez neke wek mezinên xwe nebîne.




Heger tu mejiyên zarên xwe Kurd û Kurdistanî perwerde nekî dagirkerên te yê cihê vala dagir bike,hişê wan bi nirxên xwe yî derewîn, dizî tije bike.

Heta bigir zarên te yên bibin dijminê esl û esalatan xwe, wê li dijî kurd û kurdistanê bin wê bibin xulamên serdestan, wê xwepiçûk bibînin, wê xwe wek kurd pênase nekin.

Wê tu carî hebûna xwe ya rasteqîn hez nekin. Herweha xwe jî hez nekin, bextewar hîs nekin. Dagirker hezar sal e pirtir jî sed salê piştî çar perçebûna Kurdistanê zêdetir doza li vê tunekirin û pûçkirinê dike.

Belê mûşkîle ye derfet kêm in, bandora sîstemê zêde ye, bi gelek alav û amuran ve bi her hawî  manupûle dike. Bes neyê ji bîr kirin kurd jîr in, zîrek in, wek almastê rek in, wek pola zexim in.Tenê xwebawer bin.

Xwebawerbûn jî bi himê kurd û kurdistanîbûnê ve pêkan e. Heger dil ji vê bawer be, heger kurd di vê hewlê de bin, heger bi ziman, çand û dîroka xwe ve xwe pêş bixwe, tu tişt nikare li ber kurdan bisekine wê bi serkevin.

Piştî li vê hebûna rasteqîn, aqilane, zelal sîyaset, dîplomasî, hûner her tevgerên kurd wê bi serxwe bimîne, wê têk neçe, her daîm be.

Hîm ne saxlem be ne civak, ne rêxistin saxlem namîne. Lewma ye dagirker ji zaroktiyê de kurdan bi hişê sîstema serdest bi her aliyî ve perwerde dike. Da ku toximên dagirkeriyê cî bigre, şîn bibe herweha jî belaw bibe.

Mînak royê deh caran pesnên neteweya xwe, çanda xwe, giregirên xwe, dîroka xwe dikin. xweyî zarokên xwe derkevin.

Li wan bi nirxên xwe perwerde bikin. heta diçine dibistanê 3-4 saliya wan li gor formasyonê li gor temenê wan fêrî her tiştî bikin.

Herweha bidin xwendin. Nebêjin wê paşê hîn bibin. kesayetiya zarokan heta 3 saliyê çê dibe, heta 7 saliyê jî kesayetî, takekesî dimeyê.

Divê zarokên me bêne kîjan temenê bila jixwebawer bin. Bila kurdbûna xwe serbilind bin. Bila derûniya wan bi êrîşan xirab nebe, bila xwe bi nirxên xwe biparêzin. Bila belawela nejîn.

Bila xwe kêm nebînin. Bo perwedeya zarên xwe serê xwe biêşînin. Bawer bin ew tevdir bêne girtin gelek pirsgirekên derûnî wê xwe bi xwe ji holê rabin.

Wê tûjî belayan nebin, wek bi karanîna hişbir û  ketina depresyonê heta bibêjin xwekuştine.

Bi hêviya serkeftinê. Bi hêviya mayîna Kurd û Kurdistanê.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjîma Îranê li heyva derbasbûyî ya zayînî de zêdetir ji 92 kes li Îranê de binçav kirine

Li heyva derbasbûyî anku heyva "July"yê de rêjîma Îranê zêdetir ji 92 kes li Îranê de binçav kirine ku 49 kes ji wan, welatiyên Kurd bûne.



Pêka amara "Hengaw"ê, hêzên ewlehî yên rêjîma Îranê li heyva derbasbûyî ya zayînî, "July"yê de zêdetir ji 92 kes li Îranê de binçav kirine an revandine ku ji vê amarê 49 kes welatiyên Kurd, 12 kes Gîlek, 12 kes jî Belûç bûne û li gelemperê de 22 kesên binçavkirî, jin bûne.
Herwisa Hengawê daye zanîn ku zêdetirîn rêjeya binçavkirin li vî heyvê de , li parêzgeha Urmiyê de bûye.

pêka vê amarê: Parêzgeha Urmiye 32 halet(28 welatiyên Kurd, 3 hevwelatiyên Azerî û welatiyek Behayî), parêzgeha Sine 21 halet, Parêzgeha Gîlanê 12 halet, Parêzgeha Sîstan û Belûçistanê 11 halet, parêzgeha Tehranê 7 halet( 5 hevwelatiyên Fars û 2 welatiyên Lur û Kurd), Parêzgeha Xûzistanê 3 halet ku 2 ji wan hevwelatiyên Ereb in, Parêzgeha Xurasanê 2 halet, Parêzgeha Gulistanê 2 halet(hevwelatiyek Fars û hevwelatiyek Belûç û li Parêzgeha Elborz 2 halet hatine tomarkirin.

## Rêjîma Îranê "Solmaz Hesenzade" bo girtîgeha rêjîmê li bajarê Urmiyê, veguhastin

Piştî binçavkirina hovane û dûr ji mirovahiya malbata şehîd "Mihemed Hesenzade", xwîşka wî şehîdî bo girtîgeha rêjîmê li bajarê Urmiyê û bavê wî şehîdî bo girtîgeha rêjîmê li bajarê Bokanê hatine veguhastin.



Pêka raporên belavbûyî, piştî binçavkirina "Ehmed Hesenzade" yê bavê şehîd "Mihemed Hesenzade" û xwîşka vî şehîdî ya bi navê "Solmaz Mihemedî" ji aliyê hêzên hov û dije mirovahî yên îtilaata rêjma Îranê li bajarê Bokanê, bavê wî şehîdî bo girtîgeha navendî ya rêjîmê li bajarê Bokanê hate veguhastin û pîka hinek çavkaniyan bi danîna barimteya 4 milyard Tumenî bi awayê demkî hatiye azaskirin.

Herwisa pêka wan raporan "Solmaz Mihemedzade" jî bo benda jinan a girtîgeha navendî ya rêjîmê li bajarê Urmiyê hatiye veguhastin.
Hêzên hov ên îtilaata rêjîmê li dema binçavkirinan vê malbatê, bi awayekî hovane ew kutabûn û bêrêzî bi wan kiribûn û heta dema êrîşkirin bo ser mala wan welatiyan, ti belgeyeke yasayî jî nebûne.
Şehîd Mihemed Hesenzade li 25ê Xexelwera 1401 a Rojî li pêvajoya şoreşa "Jin Jiyan Azadî"yê de ji aliyê rêjîma Îranê ve li bajarê Bokanê, hate şehîdkirin.

## Hêzên sînorî yên rêjîma Îranê ciwanekî kurd li sînorî Merîwanê kuştin

Hêzên hov ên sînorî yên rêjîma Îranê li bajarê Merîwanê, kolberekî temen 25 salî bi teqekirina rasterast kuştin û kolberek jî bi sedema kevtina ji bilindahiya çiya, canê xwe ji dest da.



Pêka rapora "Kolber News"ê, roja Pêncşemê 11ê Gelawêjê, kolberekî temen 40 salî bi navê "Nasir Osmanî" ku bavê zarokekî ye, xelkê bajarê "Rebet"ê ser bi bajarê Serdeştê, bi sedema kevtina ji bilindahiya çiya, li sînorê "Nîrwan"ê ser bi bajarê Banê, canê xwe ji dest da.

herwisa roja Çarşemî 10ê Gelawêjê jî, li demjimêrên şevê de hêzên sînorî yên rêjîma Îranê li sînorê "Siyanaw"ê de bi awayê resterast teqe li kolberekî temen 25 salî yê bi navê "Es`ed Efrence" xelkê gundê "Siyanaw"ê ser bi bajarê Mereîwanê kirin ku li encam de wî kolberî canê xwe ji dest da.

Pêka rapora "Kolber News"ê, "Es`ed Efrence" bavê zarokekî ye.
Pêka amarên "Kolber News"ê li 6 heyvên destpêkiya sala 2024 a Zayînî de 34 kolber hatine kuştin û 236 kolber jî hatine birîndarkirin ku %82 a wan li encama teqeya rasterast û kutan û lêdanê ji aliyê hêzên rêjîmê ve bûne.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (475)





## 79 Sal Xebat Û Tekoşan
## Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê

25ê Gelawêjê 2645 - 2724'an a Kurdî

**Pîroz be 79 sal xebat di pêxema armancên mirovî û neteweyî yên gelê Kurd de**

**Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê**
Navenda Ragihandinê